# PÎROZIYA RENGÊ PÎROZE DI ÇAND Û BAWERIYA KURDÎ DE

**Pênasa rengî**:
Reng bi awayên curancur tîrêjên standin û dana rûyên tiştan e. van tîrêjan dema dikevin çavan, çav awayên ewan tîrêjan ji hev cuda dike her yek û bi awayeke taybet û cuda ku jêre dibêjin reng.

**Etîmolojiya navê rengî**:
Reng peyvke resen û sagîn ê Kurdî ye ku hezaran sal e ji dapîr û bavkal ji me re maye. Peyva rengê vedigere protoîranî “**ra(a)j**” anku “**renj**”ê. Di Avestaya kevin de “**aranjanam**” anku “**arrenjenam**”e lê bi awayê “**haraanzanaum**” anku “**harrenxenawm**”ê jî kara ye di wateya “arasîn, xemlandin”ê de. Di Pehlewanî de “**rng**” û “**reng**”e. Her weha “**brng**” yan “**ebreng**”ê jî di wateya “bedew, narîn”ê de. Helbet peyva “Reng”ê ketiye gelek zimanên din ku ji ber dirêjbûna mijarê naxwazim amaj bidim hemûyan.

**Rola rengî**:
Reng di warê wate û mebestan de xwedî roleke mezin e. Di warên fîzyayî û kîmyayî de, di warên xwezayî û jîndeyî de, di warên ziman û çandî yd.. de jî reng roleke mezin dibîne, bi taybet di zimanê Kurdî de ku zengîntirîn zimanê cîhanê ye di warê reng û curên rengan de. Ferhenga “Pazar”ê ji amadekariya “Seher Moezî” zêdetir ji 74000 hezar navê rengan di xwe de digire di zimanê Kurdî de, ev ferheng mezintirîn ferhenga rengan e li ser asta hemû dunyayê ku di zimanekî de(zimanê Kurdî) zêdetirî heftê û çar hezar navan tenê ên reng hebin! Xencî wê Kurdî bo gelek wate û mebestan sûd ji rengan werdigire û mebestên xwe pê derbêj dike, bo mînak: “rengzer, rûreş, rûspî, rûzer, rûsor, destşîn, destkesk, dilreş, dilspî, dest rengîn, keskesor, rengal, rengereng, reng û reng, hemereng, rîspî(bo mêrî), serspî(bo jinê), destspî yd.. Reng rol di awayên mirovan li cîhanê de jî dibîne û em bi ren jî dikarin nasnameya mirovekî bi hêsanî nas bikin. Her weha reng roleke sereke dibîne di cudabûna awayên heşî, ajal û mirov û tiştan jî, xencê wê reng weku guzariştê jî di cîhanê de roleke mezin dibîne her weku “rengê spî, rengê aştî, pakî, bêsûcî û valahiyê ye, rengê reş rengê desthilat, xem, wêrekî û nîhaniyê ye, rengê şîn rengê tenahî û xem, îcat û aramiyê ye, rengê sor rengê evînî û hezgîniyê ye, rengê penbe rengê xeyalî û nazikiyê ye, rengê kesk rengê bext, selametî, dexesî û xwezayê ye, rengê mor

rengê saman, şahane, nîhan, xeyalê ye, rengê zer rengê hermî, ronahî, enerjî, balkêşiyê ye, rengê narincî(portuqalî) rengê enerjî, bextewerî, balkêşî, peroşîyê ye, rengê qahweyî, rengê xweza, hêz, parêzî, tehayî yd..”  Heta Kurd sembol û pîrozweriya xwe jî bi reng tabîr û guzarişt dike ku “kesk û sor û zer”in. Helbet xencî ewan mijarên ku me li amaje pê dan, gelek reng û curên reng hene di çand û baweriyên Kurdan de xwedî pîrozî, giringî, mîsyon û wateyên xwe ne ku yek ji wan rengê “PÎROZE”ye. Rengê pîroz ji nav û navlêkirina wî re xuya dike ku ji bo Kurd çi qas taybet yan jî pîroz e.

**Etîmolojiya peyva rengê Pîrozeyê**:
Rengê Pîroze rengeke kesk û meylen şîn û tevlî hinek rengê zer e. Peyva navê “**Pîroze**”yê vedigere zimanê Pehlewanî “**Pîroçek** yan **Pîrozek**”ê ku dûre zimanê nû ya Kurdî de bi jêçûna “K”ê dawîn weku “Pîroze”yê derbêj bûye. Di latînî de ku weke navê zanistî hatiye diyar kirin “**Lazolî**” yan jî “**Lapîs Lazolî**”ye. Lapîs anku kevir û Lazolî jî weku rengê şîn a pîroze ye. Her weha Lapîs ji kevirên Nîtratî yên zîvî re jî tê gotin ku di çaxên navîn de dihat hûrkirin bo dermankirin û jêbirina balûke û werimîna birînên çermê yan jî ji bo teraxûmên çavî, ji ber ku bektryakuj e. Ji bilî wê, wî kevirî ji kevn re ji bo xeml û bedewiyê hatiye bikaranîn. Tiştekî giring heye divê em behs bikin ew jî, di gelek zimên de navê hin rengan tune ye, bi taybetî rengê “şîn”. Di çendîn zimên de navê asiman û rengê şîn yan jî navê rengê şîn û kesk yek nav in, yan jî bi pêşgir û paşgirekê nav ji hev tên cudakirin. Xencî ku navên “Kesk û şîn” gelek caran li şûna hev tên, di rastî de peywendiyeke xurt jî di warê taybetîbûn, mîtolojî, wate, raman û çandî de heye, heta di nava çand û baweriyên Kurdî de jî.

**Giringî û Taybetiya rengê Pîroze di çand û baweriya Kurdan de**:
Rengê pîroze navê wê kevirê ye jî ku bi Latînî jêre dibêjin “Lapîs”
Wî kevirî ji kevin re bo gelek mebestan hatiye bikaranîn mîna “derman, xeml û dûrketin ji xerabiyê” sûd jê girtine.  Ji bo gelek curên xişil, xelm, niqêm, tac, destxencer û kelan yd.. hatiye bikaranîn. Ji aliyekî din cadû(sihir) ku tiştekî diyar bûye di kevin de û bi taybet di baweriya Mîtrayî de, her du rengê pîroze û rengê şîn xwedî roleke mezin bûne, bi taybetîtir di mîtolojî û efsaneya cîhana diyar û cîhana nediyar de, pencere û deriyên malê ku nîşana xêr û nexêriyê ne, rengkirina pencere û deriyan bi rengê Pîroze yan şîn, heman mentalîta xêr anîn û dûrketin ji nexêrî û xzebeê ye. Rengê Pîroz e weku ji navê xwe re xuya dike ku di çand û baweriya Kurdî de pîroz bûye ji hezaran sal berê, em vê taybetmendiyê li Hewraman, kela Hewlêrê û herêmên Loristanê zêdetir berçav in ku pencere û taqên xwe tev dikin rengê pîrozeyê

ev jî weku pîroz û derwazeya ronahî û tîrêjên rojê ku sembol û pîrozwera Kurdî ye. Kurd ji Zagros, Toros û Mesopotamyayê ku hezaran sal berê ye, baweriya xwe li ser fikir û felsefeya Mêhr û Mîtrayiyê ava kiriye ku dû re heman fikir û felsefe weku ol û rêbaz belavê dunyayê bû bandora xwe li ser çand û baweriyên gelek welatên weku Çîn û Japonê, Yunan û Ewrope bi giştî û welatê Misirê daniye. Rengê Pîroze jî ku di nava Kurdan pîroz bûye, rengê bawerî û hêza dûrketin ji nezer, ehrîmenî û tawanê bûye. Ta niha jî hemû pencere û piraniya deriyên li Hewramanê, Loristanê û kela Hewlêrê û gelek kel û warên kevnar, bi rengê Pîroz û şîn têne reng kirin.

**Cur û taybetmendiyên rengê pîroze di zimanê Kurdî de:**

Pîroze amal, pîroze bam, pîroze baw-î, pîroze beş, pîroze reng, pîroze şêwe, pîroze şîn, pîrozeyî, pîroze baxtkirdê, pîroze baz, pîroze çurusk, pîroze bor, pîroze mat, pîroze boz, pîroze rengdar, pîroze bêgerd, pîroze pirşengdar, pîroze pir reng, pîroze tar, pîroze tund, pîroze terze, pîroze têr, pîroze tuj, pîroze ciwan, pîroze çîrr, pîroze xam, pîroze xum, pîroze xweş, pîroze xest, pîroze xem, pîroze dij, pîroze dexş, pîroze dûd, pîroze dêz, pîroze çûyî, pîroze roşen, pîroze rûn, pîroze sard, pîroze germ, pîroze zîv, pîroze şad, pîroze jak, pîroze sade, pîroze şêlû, pîroze ferîk, pîroze tune, pîroze kal, pîroze kirêt, pîroze veker, pîroze kiz, pîroze kos-kews, pîroze girtî, pîroze girj, pîroze gul, pîroze geş, pîroze gen, pîroze lêl, pîroze mirde, pîroze xemrî, pîroze waz, pîroze rengîn, pîroze zilkedar, pîroze zerd, pîroze zelal, pîroze jengar, pîroze saf, pîroze samal, pîroze spat, pîroze sist, pîroze soxt, pîroze sivik, pîroze sewz, pîroze sîs, pîroze şêl, pîroze şeng, pîroze katran-î, pîroze kew, pîroze giran, pîroze gurrdar, pîroze gilav, pîroze gerr, pîroze gewz, pîroze nehez, pîroze next, pîroze nexşîn, pîroze neman, pîroze nîvreng, pîroze nepuxt" yd…
Evne pajek in ji rengên pîroze lê bi hinek rewşên cuda yan jî gelek mebestên cuda

**Pîroziya rengê Pîroze li ba Kurdan û bandora wê li ser derên din**:
Bi giştî rengê pîroze bi rêya çand û baweriya Kurdî yan li derveyê wê, di nava gelek çand û baweriyên din de eger pîroz û tabet jî nebe weku li ba Kurdan heye, lê xwedî giringî ye. Ji mêjîn de rengê pîroze li kêleka rengê şîn bi hev re du hêmanên sereke bûne di gelek warên selametî, pakî, parêzî û pîroziyê de. Rengê pîroze di nava çanda ewropeyî û yunaniyan de xwedî pîvaneke, di gelek xemlên koşk û seray yan jî estetîk û eksswarên şah û keyan de weku rengeke diyar roldar bûye.

*Têbînî: Pîroze navê cure firendeyeke ku jêre Hûma'yê jî tê gotin, wê/wî firendeyî li gor mîtolojiya wê/wî, bi ser kî re sîber bike, wî kesî dibe şah û mezin*

**//**Lêkolîn û nivîsandin: Qendîl Şeyxbizînî
Çavkanî: Ferhenga Pazar